

**Sûrîye – Daxuyannameyeke Hevbeş û Lezgîn: Metirsîne Rastîn Ser
Jîyana Girtîyên di Zindana Himsê ya Navendî de
“Bi Sedan Girtîyên Bi Darê Zorê bi Daxwaza Serbestberdanê Dikevin Gireva
Birçîbûnê”**

Di roja sêşemê 17ê Cotmeha 2017 an de, (520) girtîyên di zindana navendî ya Himsê de, piştî salan ji girtîna bi darê zorê, daxwaza serbestberdanê kirin. Her wisa, ev daxwaz piştî geflêxwarinên rêveberîya nû ya zindanê " General Bîlal Silêman" bi qutkirina elektrîk û avê çend saetan li ser zindaniyan derbarê hewldana têkçûyî ya derbasbûna zindanê de. Jixwe, du avahî di bin destê zindaniyan de ye, ew jî ji tirs ku hin ji wan werin şandin dadgehên awarte û beşên ewlehîyê.

Piştî seredana şandeke ji komîteya navdewletî ya Xaç Sor di 16ê Cotmeha 2017 an de, ji bo zelalkirina rewşa tenduristî û xwarinê û yên din a zindaniyan, pirsgerêka zindana Himsê ya navendî dîsa derkete holê, lê rêveberîya zindanê çavdêriya hevdiîtan kir û neşite ku daxwazên girtîyan bi temamî bigihê destê komîteyê, bi taybetî daxwazên (492) girtîyên ku bi sedema nakokî û bûyerên Sûrîyeyî hatibûn girtin, yên ku gelek sal bi ser girtina wan ketiye(piraniya girtîyan ji 2011 û 2012an de ji beşên ewlekarîyê hatine zindanê). Li gor çavkanîne piştrast ji nava zindanê (28) kes pêrgî metirsîya dadgehkirin leşkerî ya meydanî tên, ligel (462) kes hatine veguhaztin " Dadgeha Terorê" ya li gor pîvanên navdewletî ne gunçan e, û jixwe (30) girtî bi sedemine tawankar in.

Rêxistinên ku li ser vê daxuyannameyê imzekirine, daxwaza bersivdayîna lezgîn a daxwazên girevgîran li hikûmeta Sûrîyeyê dikin, bi taybetî mijarên girêdayî pîskirin û dirêjkirina girtina wan a bi darê zorê. Her wisa, îmzekeran doza rawestandina veguhaztina girtîyan a dadgehên leşkerî yên meydanî wek "Dadgeha Terorê", û rawestandina pêkanîna hemû hikmên bidarvekirinê, dikin.

Doza îmzekeran:

Ji Netewyên Yekbûyî û bîroya Komosyonerê bilind ê mafê mirovan re:

1. Xebata li ser peydakirina garantîyan ku tu komkujî bi serê zindaniyan an rastî îşkence û pîskirinê neyên.
2. Fişar li hikûmeta Sûrîyeyê were kirin ku hemû dadgehkirinên zordar ên ku di mafê girtîyan de li ber dadgehine ku bi awayekî nerewa hatine saz kirin û dûrî pîvanên navdewletî yên dadgehkirinên dadmend e, ji nû ve kar li ser bê kirin.

Ji komîteya navdewletî ya xaça sor re:

Guhdarkirina daxwazên rastîn ên zindaniyan û misogerkirina ewlehîya wan derbarê seredaneke meydanî ya awarte ji bo naskirina rewşa tenduristî ya bêtirî (25) kesê temendirêj (di ser 60 salî de) ên ku bi nexweşiyên giranin, wek dil û şekir .. hwd.

Ji aliyên ku serperîştîya danûstandinên Astanayê dikin û bîroya Şanderê Taybet re:

Divê, fişar li hikûmeta Sûrîyeyê û ya Rûsîyayê were kirin, ji bo ku pirsgerêkên girtîyan bi yê leşkerî ve neyên kirin û redkirina girêdana pirsgerêka zindana Himsê ya navendî bi rewşa leşkerî ya hawîrdorê ve, wek çawa ku hevpeyman Taxa El-we'ir a Himsê, wê çaxê walîyê Himsê zindani agahar kir ku rewşa wan bi ya El-we'r ve girêdayî ye, lê di encamê de tu kes piştî îmzekirina hevpeymanê El-we'ir nehat berdan.

Rêxistinên Îmzeker:

1. Association of Detainees and Missing Persons in Sednaya Prison
2. Dawlaty
3. Doctors and Lawyers for Human Rights
4. EuroMed Rights
5. Human Rights Guardians
6. Justice for Life Organization
7. Syrians for Truth and Justice
8. Syrian Network for Human Rights
9. Syrian Center for Media and Freedom of Expression
10. Syrian Center for Legal Studies and Research
11. Syria Justice and Accountability Center
12. The Day After
13. Urnammu
14. Violations Documentation Center in Syria